



HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar: 6/Tirmeh /1981





HÊVI

Kurdiya Kurdiya Kurdiya Kurdiya

Hejmar: 6/Tirmeh /1981

TEXISTINÎ


KURDISTAN	2
HOPANÎ.....	5
GURRIYE KEVOKVAN.....	7
GEWRE ÇEWA GUND DÎT.....	12
ELFABA HEJMARAN.....	15
ÇI ÇIYE?	16

KURDISTAN

Ez Kurd im.Navê welatê min Kurdistan e .
Kurdistan welateki pîr xweş e.Çiyayên wê bî-
lind in.Zivistanan jî berfê spi dîkîn. Berfa
serê çiyayên Kurdistanê dereng dihele. Pîrê
salan lî serê çiyayên bîlind havina jî berf
kêm na be.Lî aliyê dîn gava bihar tê,deşt û
zozan hêşin dîkîn.Kulilk vedîkîn.Reng reng
reng erdê dînexşinîn û bihneke xweş jî wan
dîfûre.

Çem û rûbarên Kurdistanê,herdem bî xuşe
xuş û leme lem diherikîn û zeviyên Kurdistana-
nê av didîn.Gavadibe bihar,baran tê û jî
germê,berfa serê çiya dest bî helandinê dîke
ava cuhîka pîr dibe û diherike,~~tê dîke~~ve çem
û rûbaran.Vê gavê av şolî dibe,radibe û bî
xumîneke kûr diherike.

Zeviyên Kurdistan,bî xêr û bêr in. Her
cur çandîni dî wan de şîn tê.Genim,ceh,nisk,



nok garis û h.w.d.Mırov çı fêkiyi bixwaze dıkare lı Kurdistanê peyda bıke.Sêv,hırmı,hı jir,hınar,xox,mışmış û biyokê Kurdistanê ge- leki navdar û bı tam ın.Zebeş û petêxê Kur- dıstan jı gelek navdar ın.Payıza mırov jı ta ma tri têr na be.

↳ Kurdistanê,pez û dewar jı tênxwedikı- rınê.Koçer,zıvıstana keriyên xwe dadıxın deştan û havinan jı hıldıkışın zozanan, ciyê hênık û hêşnayı.

Kurdıstan jı ali maden û petrola xwe jı welateki dewlemend e.

Lê gelek mîxabin, welatê me iro bûye çar beş û ketiye bin destên çar dewletên biyani. Îro, Tırki, İnan, İraq û Sûri Kurdîstana me di nav xwe de beş kirine û dewlemendiyên welatê me giş ji bo xwe dibin.

Di welatê me de mafê me ji hemû ji me stendine. Nahêlin, em bi zîmanê xwe bixwinin û bixayin. Gava em mafê xwe dixwazin, li me didin, dê û bavê me dikujin, dixin girtigehan. Zîlm û zordestiki dijwar li ser me heye.

Lê em natîrsin. Em dev ji doza mafên xwe bernadin. İro dê û bavê me xwişk û brayên me bo Kurdîstana me yi şêrin şer dikin. Sibê em bîghijin emê ji şopa wan bajon. Em biçûkê Kurdistan weki hevalên xwe yên dinê yên din, dixwazin dinyake bê zîlm û zordesti, ronî û şêrin de bijin. Bira dê û bavê me neyên kuştin, em sêwi neminin.



HOPANI

Hopani listıkeke zarokan e. Dı vê listikê de; çend zarok lı hember hev rûdınên û bı hev re dıkevın hemberiyê. Beri ku tıştan jı hev bıpırsın, hev dijmêrın. Jımar lı ki(kê) keve ew kes dest bı lihevhatıyan (tekerleme) dıke. Listık wiha dıgere. Ku yeki xılas kır, dijmê - rın, icar yê dın dest pê dıke. Carnan jımartın wiha dest pê dıke:

-Jı vi seri
Jı wi seri
Xêrê bıbinım
Jı wi seri!

"Seri" ya dawı lı ki(kê) keve ew dest bı

lihevhatiyê dîke. Jî van lihevhatiyan yek 11
jêr e:

HOPANI

Hopani hopani
Keziya mîn a pani
Avêt gola hani
Gola han çamiş e
Kekê mîn çawiş e
Çawişê piçûk e
Jê re anin bûk e
Bûka Hesên Begê
Sêva ser kulekê
Vê sêvê hiltinim
Wê gulê datinim
Gul gula hedadan
Derî lî mîn radan
Çûm quncîkê tari
Teyrek tê dînali
Mîn got: Teyro çîye?
Got: Tasa zengîl e
Mîn kuta ber dîl e
Çûm heta Mûsîle
Çî Mûsîleki xas e
Tenê bî derpi û kiras e.

.....

.....



GURIYE KEVOKVAN

"Zû werin Gurri vaye! bazdîn!.. bazdîn!"

Paşe ji qijvijê şiyarbû, pişti ku hîskîr Gurri dî qesrê de ye, ferman da vi ali wi ali, "bî saxi an mîriti ez wi dixwazim!" Gava lawê wezir ket odê, dit ku qîza paşê di anava nivîna de xewroşka dixwine. Lî wir ne Gurri û ne ji keseki dîn hebû. Ji qîzîkê re got:

"Bistîka berê Gurri lî vir ditîne, ka bêje bî ku da çû!"

Qîzîkê bi hêrs qîriya:

"Ka namûsa bavê min çawa qebûl dîke, vê şeva han te dişîne oda min? Û tu ji çawa dîkari van peyva jî man ra bêjî? Zû jî vir derê, here!"

Lawê wezir bî hurmet xwar bû:

"Bîbore" got. "Ez hew fermanên bavê te bî cih tinim. Tu sûcê min tune, ferman da ku em

lî her derê bigerın."

Lî her derê gerıyan. Jî çekê ku dema Gurri ketıbû qesrê cıvandıbû pêştır tu tışt nedın.

Lawê wezır got:

"Ewana çekên mın ın. Ku Gurri ne anibe, kê anıye vıra? Ezê jî paşê re bêjım."

Wê gavê Gurri lî tenışta qızıkê rûniştıbû, dı guhê wê de dıgot:

"Qet metırse, ezê bêm te xelaskım."

Gurri rabû xwe jî notırvanên hundırê odê xelaskır, lê dı nabera sê-çar notırvanên ber deri nıkarıbû derbas bıbe. Dema bı wan re xwe gıjgıjand, kumıkê Gurri jî serê wi ket, wan jî Gurri hışk zeft kırın, gırêdan. Her çıqas qırıya, got: "Hûn wiha ser vekırı, nıkarın mın derxın hıızûra paşê, ev bê hurmeti ye " jî lawê wezır guh nedayê, kumık lê venegerand.

Paşe, pıştı Gurri hat hıızûra wi qırıya:

"Haya te jî tıştê te kırıye heye, te mala dewlemendan şeland, te temamê leşkerê mın şıkand. Ez vana napırsım, ka bêje karê te lî oda qıza mın çı bû? Ezê niha ban wezırê xwe kım, serê te bıdım jêkırın!"

Gurri:

"Lî ber fermana te stuyê mın xwar e" got. "Ka destûr bıde bıra pêşiyê mın jî vê fediyê xelaskın, lî hıızûra te wiha servekırı, dest gırêdayi ez nıkarım hurmeta xwe nişan bıdım, bo vê yekê dıkevım bıne erdê."

Paşe, ferman kır bo kumık lê vegerının û destê wi vekın. Her çıqa lawê wezır, lî hember dayına kumık bû jî jî tırta fermanê newêribû dengê xwe derxe.



Piştî destê wi hat vekîrîn û kumîk lê ve
gerandin, Gurri zû zû kumîk da serê xwe û jî
ber çavan wînda bû.

Paşê, hêrs bû û qirîya:

"Ka tu bî ku da çûyî, derkeve meydanê!"

Lawê wezîr bî tîrs :

"Paşê min" got. "Nîkare bî cîkî de here ,
dî bî kumîk de xwe vedîşêre. Ka ferman bîdîn
bîra derîya bigrîn. An na wê bireve."


Gurri dest bî revê kîr, lê dit ku tu qulî
kek revê ne maye. Her derê leşkera girtîye .
Paşe ban cêlad kîr, lawê wezîr nişan da û
ferman kîr:

"Serê wi jêkîn!"

Pîştî ku lawê wezîr xwe avêt piyê wi û
lî ber gerîya, got:

"Te sêhra wi kumîki zanibû, çîma te jî
mîn re negot." Duvra vegerîya ser cêlad:

"Fermana mîn bîra bî cih bê, serê wi jê-
kîn!"




Nivê şevê, cellad ferman bî cih ani.

Qiza paşê gava bihist Gurri ketiye feqê
û lawê wezir ji hatiye kuştin, jî qewraşa xwe
re got:

"Ka em çî dîsekînin, em lî benda wezir 'in
ku bê me itham bike? Rabe em ji herin ba di-
ya Gurri. Em seri bîdî hev, divê ku em rêkî
bîbînin. An na, jîna heskîriyê min dî talûke
de ye."

Jî tevliheviyê fîrset dîbinî û bê haya
notîrvanan jî qesrê derketin. Rast çûn mala
Gurri. Jî nîka extiyar, lî quncîkeki rûniştîbû
hîrî dirêsa. Kevok jî dî xewê de bûn. Çî bûye
çûye hemî jî wê re jî gotin. Jî nîk ramiya û
dûvra rabû çû bîzî û kevokan şiyar kîr.

(dûmahîk heye)



GEWRÊ ÇAWA GUND DÎT

J1 rojan rojeke bîharê bû. Gewrê, Rêber û Lezgin hersê li ber kar û berxan bûn. Kar û berxên wan di nav nefelê de xweş diçêriyan. Wan ji, j1 xwe re hêdi hêdi, kulilk û beybûn berev dikirin. Rêber, carekê di ser xwe re li ezmana nihêri, ku ewr reş û giran dibin. Di ci de, berê xwe bi Gewrê û Lezgin de kir û got:

-Hevalno, ez bawer dikim vaye baran tê ka em beri baranê xwe bigihinin malê.

Herduyan ji bi hev re gotin:

-Na, na baran tune, tavê bîharê zû derbas dibin.

Lê belê her ku, çû ewr reş bû û mijeki reş û tari xwe bera erdê da. Dinya wisa tari bû, ku mirov tiliyan di çavê hev ra ke, mirov cardin hev nabine. Edî wilo bû ku, çavê wan kar û berxê wan ji nedidit. Hersê ji tirsî yan, gotin:

-Ka em zû xwe bigîhinin malê. Xwestin kar û berxên xwe ji bî xwe re bibin, lê kîrîn nekîrîn çavên wan ew neditin. Mecbûr man, berê xwe dan xîrbe û bî lez bî rê ketin. Bistekê çûn, lê haybûn ku, ne li ser riya xîrbe ne ango ne li ser riya gundin. Lê cardin meşî - yan.

Digotin:

-Hela ka emê li ku derên. Bî vi hawayî, dora 2-3 seetan meşiyabûn. Hêdi hêdi mij, ji hev bela dibû. Qaseki dîn, bî tevayî ji hev bela bû û dinê gelek xweş bû, roj derket. Bala xwe danê, ku li dereke xîr û xalî ne, ne şivan li wan dorana hene û ne ji tu gund ji wan ve xuya ne. Hersê bî ser hev de ponijîn gotin:

-Ka emê çawa riya gund derxî?

Lezgin: Gund li şûn me ve ma.

Rêber: Na li pêş me ye.

Bistekê li ser vê yekê, ketin gewriya hev. Gewrê got:

-Bisekînin, mîn dit!

Lezgin lê vegerand:

-Ka! Te çewa dit.

Gewrê:

-A waye mitê (gîr) Koço. Ma xîrbê me ne li başûrê mitê Koço bû.

Rêber bî tînazi got:

-Erê li başûrê mitê Koço ye. Lê ka em çî zanî başûrê mit kîjan e.

Gewrê got:

-Bisekînin ez zanîm! Li dibîstanê mamos-tê me kifşkirîna alîya nişani me dabû. Em, alî -a bibînin wê wextê emê zanîbî başûrê mit kîjan alî ye.



Rêber:

-De,ka tûyê çewa aliyan bîbini?

Gewrê:

-A nîha dem beri nivro ye.Hûn dîzanin ku roj jî ali rohilat hîltê.Beri nivro,roj lî a lî rohilat e.Ku em lî piya herdu milên xwe vekin û milê me yê rastê were ali rojê, wê demê milê rastê rohilat nişan dîde.Milê çepê jî rojava nişan dîde.Berê mirov dikeve bakûr û başûr jî lî pişt mirov dimine.

Lezgin:

-De heydê zû em çêkîn.Gewrê lî piya milên xwe vekir û destê xwe yê rast ber bî rojê ani.Bî vi awayî her çar aliyên himi jî ditin. Gewrê got:

-Bînêrîn,mîç waye lî başûr dimine.

Rêber:

-We demê divê em rast ber bî başûr de bimeşin.Hemûyan gotin:

-Erê,rast e!

Û meşîyan,ber bî gund de çûn.

ELFABA HEJMARAN

Geli hevalên cani mani,

Wek alfaba nîvisê, alfaba hejmaran ji he-
ye. Alfaba hejmaran, ji tune (sifir) heta nehan
e. Ev deh hejmar çaxa, ku li pey hev rêz bîbin
û bêne nîvisandin, hejmarên mezin çêdibin. Em
niha heta ~~bi~~ bî gîryazan bîjmêrin.

Jeha

0
tune
(sifir)

1
yek

2
dudo

3
sisê

4
çar

5
pênc



6
şeş

7
heft

8
heşt

9
neh

10
deh



ASTRID LINDGREN



Kesil Şerrüt Lotta

Alf Kunduzlu Förlager!

Keça
Şerrüt
Lotta

(KE)

Alfons
û cindwir

Guzê Berzestan



DU PIRTÛKÊN KURDÎ
BO ZAROKAN DERKETIN!



H E V I:

ADRESS/NAVNIŞAN:

Kovara Kurdi ya zarokan
Kurdish children magazine
Kurdisk barn tidning

Hêvi: BOX 5034
163 05 Spånga/SWEDEN
Postgiro: 439 33 42-3

ISSN:0280-0241

PRIS/BÛHA: 3 kronor - SUBSCRIPTION/ABONE: 30 kronor per år